

“BÎLA EV KUŞTÎN,
KUŞTÎNA ME YA DAWÎ BE”

»»» R:9



Gelê me yê li Başûr ,Bakur û Rojava, li gorî
diviyabû piştgirîya xuşk û birayên xwe yên Rojhilat

nekirin

»»» R:4

Êrîşa balêstîkî ya li ser sivîlan nîşan da
Îran bombeya Etomî dixwaze!

»»» R:7

Şoreşa (Jîna Emînî) sînorên
Îranê derbas dike

»»» R:8

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (431) 07-10-2022 Buha (1000) Tûmen

Mîstefa Hicrî: Bi wan zûyan xelk dê dawî bi dirindehiya rejîma Komara Îslamî bîne

Rêzdar Mîstefa Hicrî, Berpirsê Navenda Birêveberiya Gîştî ya PDKÎ bi belavkirina peyamekê rû li tex û qatên civatgeha Kurdistan û Îranê ragihand ku xelk bi wan zûyane dê dawiyê bi hovîti û dirindehiya rejîma Komara Îslamî bîne.

Deqa peyama Mîstefa Hicrî wiha ye:

Xelkê mafxwaz ên Kurdistanê!

Jinên serbest û azadîxwaz!

Ciwanên xebatkar ên xweragir

Li rojên dijwar yên xebat û têkoşîna we yên li dijî rejîma teror û tarîpereşt a Komara Îslamî û piştî derbasbûna çend dehikan li ser xebata we ya neberanber ya digel rejîmekê ku hemû dahat û saman, kiramet û azadî û nasname û bi gîştî hemû hebûna we dagîr û talan kiriye; Di niha de û li nêzkîbûna rikeberiya çarenivîs-saz ku rejîma Îslamî bi tewahî bêçare kiriye, eva hûn in ku qehremanê vê xebatê ne ku li ser şeqman û li girtîgehan û zanîngeh



û xwandingehan û li her cihekê ne dawî bi dirindehiyên Komara Îslamî binin.

Tev pêşkevtinên niha yên li dijî Komara Îslamî di demekê de ne ku rejîm ji rûyê bêçareyî û bê hêvîbûnê ve û bi mebesta xwerizgarkirin ji qobiyekê ku bixwe çê kiriye, weke hertim Jîna û Jînayan dikuje, binke û cihên rûniştîyan û xwendingeha malbata hevxebatên we, wate pêşmergeyên Kurdistanê bi çeka herî giran û komkuj dike armanc, ev çek û teqemeniyên ku bi pere û samana Îranê ku tev ya we ye, kirîye û li dijî we di kûrahiya axa Herêma Kurdistanê de bikar tîne.

Niha cihê vê yekê ye ku em hemû bi yekgirtî û yekdengî û bi hev re bi mangirtineke seranserî ku li roja Şemî 9'ê Rezbera 1401'an deşt pê dike, tevî piştevanîkirin ji mangirtina mamosteyan, xwandekaran û dersxwanan, dawiyê bi temenek pîlan û direwên Komara Îslamî binin û nîşanî cîhanê bibin ku em hêjayê jiyanê serdemiyane ne.

Serkevtin ya me ye

Mîstefa Hicrî

Berpirsê Navenda Birêveberiya Gîştî ya PDKÎ

Berpîrsê Navenda Birêveberî ya PDKÎ peyamek rû li xelkê Belûçîstanê belav kir

Mîstefa Hicrî, Berpîrsê Navenda Birêveberî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê derheq cinayeta Komara Îslamî li Belûçîstanê peyamek belav kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Xelkê hatinî çewsandin û azadîxwazên Belûçîstanê!

Ciwanên hişiyar û zîrek!

Me di demekê de hêşta termê şehîdên 6ê Rezberê ku di encama mûşekbarana Spaha Pasdaran a Komara Îslamî ya Îranê bo ser binke û bargeh û cihê akincîbûna malbatên me ku hatibûne şehîdkirin, bi axê nesipartibûn, nûçeya şehîdbûna xelkê Zahidanê li 8ê Rezberê gihîşte me.

Herçiqas jidestdana ezîzan nexweş û bi azar e, lê cihê



şanazîyê ye ku xortên çeleng û zîrek yên wî welatî li hemû cih û navçeyê welat yekgirtî û yekparçeyî bi hev re bo rizgarî ji destê rejîmekê rabûne û bi tundî û micidî û bi yekcarî wê rejîmê bipêçin ku ti tiştê ji mirovayetiye nizane.

Girevgirtina berfireha îro ya xelkê Kurdistanê, li ser daxwaza Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê û piştevaniya bê mînak ya xelkê Îranê ji vê girevgirtinê, tevî gefên hêzên serkutkaran, hêvîbexşîna wê serkevtinê ye.

Em sersaxiyê dibêjine xelkê xembar yên Zahidanê û hemû netewa Belûç

Me hevparê xemê xwe biza-nin

Serkevtin bo me ye

Berpîrsê Navenda Birêveberî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Mîstefa Hicrî

9ê Rezbera 1401an a Rojî

Banghêjiya Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê bo mangirtina seranserî li Kurdistanê

Xelkê azadîxwaz û xebatkaryên Kurdistanê!

Komara Îslamî ya Îranê ku li navxweyî welat digel serhildana cemawerî ya seranserî rû bi rû ye û di hember serhildanan de bêçare maye, carek din jî bi mebesta xapandina hizra giştî û dîrxistina çavdêriyan li ser nerizayetiyan navxwe, cinayeteke din afirand. Di vê cinayetiye de rejîma Îranê, Kurdistan û partiyên Kurdî ku di destpêkê de neyê qahîm ji vê rejîmê re gotine, kir bi armanca mûşekên balîstîk û dronên xweteqîner.

Spaha Pasdaran a terorîst li 6ê Rezberê bi awayê hovane û dirindane binke û baregehên partiyên Kurdistanê ku hemû demî kelha berxwedanî û azadiyê bûne, kiriye armanca mûşek û dronên xweteqîner û di deverên sînorî de jî bi dron û topxaneyan êrîş



ناوهندی هاوکاری حیزبه کانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کردستان ایران

kiriye li ser binkeyên ser-
eke yên pêşmergeyan. Êrîş
û destdirêjiyên Spaha Pas-
daran bo ser binkeyên me

tenê armançek li pişt e, ku
ev jî xapandina hizra giştî li
derheq nerizayetiyan xelkê û
valakirina kerb û kînen xwe

yên berê û hertimiyên xwe li
tevgera rizgarîxwaziya Kurd-
îstanê.

Em Ji hemû xelkê Kurdistanê
daxwaz dikin ku roja Şemî 9ê
Rezberê bi grevgirtina seran-
serî li dijî êrîşa terorîstî yên
Komra Îslamî ya li ser par-
tiyên Kurdan, nerizayetiyan
xwe bînine ziman û carek din
jî li ser piştevaniya hertimî
ya xwe li hereketa Kurdistanê
pêdagîr bin.

Herwisa em ji hemû xelkê
xebatkar ên Îranê, hereket û
aliyên siyasî û kesayetiyan
xebatkar li seranserê Îranê
daxwaz dikin ku bi nerizay-
etiya seranserî li me û xelkê
Kurdistanê piştevanî bikin
û êrîşa terorîstî ya rejîmê bo
ser binkeyên partiyên Kurdan
şermazar bikin.

Navenda Hevkarî ya Partiyên
Kurdistanê Îranê

7ê Rebera 1401an a Rojî

Piştewaniya Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê ji mangirtina mamoste û xwandingehên Îranê

Şêwreya Hevahengî ya rêkxirawên sinfî yên mamosteyên Îranê banghêjiya mangirtinê ragihandiye.

Di daxuyaniya Şêwreya Hevahengîkirina Rêkxirawên Sinfî yên mamosteyên Îranê tevî nîşandana nerazîbûnê li hember serkurtariyên berfireh yên nerizayetiyan di heyama rojên derbasbûyî de, hatiye: “Piraniya wan xelkê nerazî yên bêzar, her ev dersxwan û xwandekar in ku digel milyonan xelkê Îranê yên din ji serkurtariyên heyî bêzar bûne û bi sedan kes ji wan niha di girtîgehan û bin givaş û îşkenceyan derûnî û cismî de ne; mixabin şeva Yekşemî hêzên serkurtkar hunirî zanîngeha Şerîf bûn û bi çek di hember zarokên elît yên nîştiman de rawestan, da ku bi xeyalên xav yên xwe dengê wan ciwanên mafxwaz yên nîştiman kip bikin”.

Di nîşandana nerazîbûnê derheq rewşek wiha de,



ناوهندی هاوکاری حیزبه کانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کردستان ایران

“Şêwreya Hevahengî ya Rêkxirawên Sinfî yên mamosteyên Îranê ji mamoste û dersxwanan daxwaz dîkin ku roja Sêşemî 12`ê Rezberê bi birêvebirina mangirtinê di xwandingehan de amade nebin û hevgirtîbûn û bihevrebûna xwe digel tev kesên nerazî yên bêzar li hember nedadperweriyên zal de nîşan bidin.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê tevî piştewanîkirin ji vê banghêjiyê ji tev mamosteyan, dersxwanan û xwandekarên Kurdistanê û herwisa xwandekarên Kurd yên li zanîngehên Îranê ku hertim di xebatên medenî yên Îranê de pêşeng bûne û hene daxwaz dike ku di vê mangirtina seranserê de beşdar bin, ji berku hertim rola hevahengîkirin û pêşengbûnê hebûne.

Herwisa ji tev tex û qatên civakê, karmend û kedkarên seranserê Îran û Kurdistanê daxwaz dike: Bi her awayî îmkân heye ji xwenîşandanên derbasbûyî û mangirtina mamosteyan piştewanî bikin û bi hevgirtin û yekîtiyê di hemû qadan de xebat û nerazîbûnan berdewam bikin.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê

11`ê Rezbera 1401`an a Rojî

Dironek Spaha Pasdaran kevte ber destê Hêza Pêşmerge Kurdistanê

Navenda Hêza Pêşmerge Kurdistanê bi belavkirina daxuyaniyekê daye zanîn ku dironek têkşikeştî ya Spaha Pasdaran li nêzî “Girdçadir”ê kevte ber destê Hêza Pêşmerge Kurdistanê.

Deqa daxuyaniyê wiha ye:

Komara Îslamî li êrîşa terorîstiya xwe ya roja 6ê Rezberê bo ser binke û malbatên Hizba Demokrat, ji mûşekên balîstîkî û dironên terorîstî mifa vergirtibû. Em bo haydarî radigehînin ku bi teqeya pedafenda Hêza Pêşmerge Kurdistanê çend dironek bûn bi armanc ku yek ji wan dironên têkşikeştî li nêzî “Girdçadir”ê kevte xwarê û ber destê Hêza Pêşmerge Kurdistanê ye.

Navenda Hêza Pêşmerge Kurdistanê

هێزی پێشمه‌رگه‌ی کوردستان
Kurdistan's Peshmarga Forces



7ê Rezbera 1401an

Gelê me yê li Başûr ,Bakur û Rojava, li gorî diviyabû piştgirîya xuşk û birayên xwe yên Rojhilat nekirin



N: Mustafa Özçelik

Ji aliyê polisên Dewleta Îranê ve kuştina keça Kurd Jîna Emînî, di dîroka Rojhilatê Kurdistanê û Îranê da rûpeleke nû vekir. Jîna Emînî, ji ber ku porê wê di binê hîcabê da dixuya, ji aliyê "polisên ehlaqê" yên Dewleta Îranê ve hate desteser kirin, piştî îşkeceyeke mezin, Jîna Emînî jîyana xwe ji deşt da.

Kuştina Jîna Emînî, di eslê xwe da, careke din bû nişan û dilopa dawî ya ji bo aşkere kirina bi dehan şeweyên zilm, zordarî, neheqî, bêedaletî, dagirkerî û kevneperestîya rejîma Îslamî ya Îranê. Kuştina Jîna Emînî, encam û nimûyeke berbiçav a ji holê rakirina azadîya jinan, bînpê kirina mafê mirovan û darve kirina mirovan bû; encam û nimûyeke dagirkerî ya li Kurdistanê û tune hesibandina mafên neteweyî yên miletê kurd bû; encam û nimûyeke zilm û zordarî û bêperwatîya Dewleta Îranê ya li ser gelên Faris, Azerî, Belûcî, Ereb, Tirkmen bû. Ji ber vê rastîyê jî, ne tenê gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê, bi sedhezaran gelên Faris, Azerî, Belûcî, Ereb, Tirkmenan û milyonan jinan li Îranê û li her aliyê cihanê hem kuştina Jîna Emînî, hem jî hemû zilm û zordariyên Dewleta Îranê protesto kirin, şermazar kirin.

Piştî kuştina Jîna Emînî, meriv dikare bêje ku, li Rojhilatê Kurdistanê vejîneke nû ya neteweyî, niştimanî çêbû û li Rojhilatê Kurdistanê û li Îranê rûpelekî nû vebû. Bi taybetî, bi heşt û hişmendîyeke xurt a



niştimanî beşdarîya gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê ya ji bo her du bangên greva giştî (mang girtina giştî) ya Navenda Hevkarîyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê, deştpekeke nû bû. Ev beşdarîya grevên giştî, di eslê xwe da helwesteke neteweyî bû. Herweha tesîra yekgirtina herdu baskên Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê û tesîr û girîngîya tifaqa Navenda Hevkarîyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê jî nişan dida. Ev helwesta gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê helwest û mesajê gelekî watedar bû ji bo Dewleta Îranê.

Dewleta Îranê ya ku nikarîbû rê li ber xwepêşandan û greva giştî (mang girtina giştî) ya bi sed hezaran kesan bigire, ji 100î zêdetir xwepêşander kuşt, bi hezaran kes desteser kir, birîndar kir; êrîş bir ser baregehên Başûrê Kurdistanê yên PDK Îran (Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê), Komeleya Şoreşgerê Zahmetkêşên Kurdistanê Îranê û PAK (Partiya Azadîya Kurdistanê) a Rojhilatê Kurdistanê û 18 wêlaperwerê Kurd kuşt, 50 kes jî birîndar kir.

Lê raperîna gelê me û ya gelên Îranê nerawastîya ye. Raperîna gelên Kurdistanê û Îranê tê wateya ku "Em zilm û zordariya Dewlet û Rejîma Îslamî ya Îranê naxwazin". Ev raperîna sîvîl a gelên Kurdistanê û Îranê, di hemû cihanê da deng veda, gelên cihanê, dezgehên sîvîl, partiyên siyasî û gelek dewletên cihanê piştgirîya

xwe ji xwepêşanderan ra diyar kirin. Ev jî ji bo Dewleta Îranê şikesteke mezin bû. Dewleta Îranê, ji bo vê serîhildana sîvîl a gelên Kurdistanê û Îranê têk bide û ji rê û armanca wê ya meşrû dûr bixe, gelek provokasyonan dike; bi deştê noker û ajan û hêzên xwe yên aşkere û veşartî, gelek cîh û warên sîvîl, dînî dişewitîne û bi cîl û bergên pêşmergeyan êrîşan dibe ser xwepêşanderan, dibe ser gel. Serîhildana li Rojhilatê Kurdistanê, nişan û encama xebata partiyên Kurdistanê ye, nişana hişyarî, bawermendî û helwesta neteweyî, niştimanî ya gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê ye. Serîhildana gelên Faris, Azerî, Belûcî, Ereb, Tirkmen jî nişana nerazîbûna ji siyasî û kiryarên vê Rejîma Dîktator e.

Serîhildanên li bajarên Îranê, deştê gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê xurtir dike. Helbete ku daxwaz û armancên gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê yên cuda jî û yên bi gelên Faris, Azerî, Belûcî, Ereb, Tirkmen ra hevbeş jî hene. Serîhildana gelên Faris, Azerî, Belûcî, Ereb, Tirkmen, hem ji bo serîhildana gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê bûye piştgirî û hem jî nehiştîye gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê bi tenê bibe hedefa êrîşên Dewleta Îranê. Herweha ji bo xebat û têkoşîna hevbeş a dûr û dirêj a gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê û gelên Faris, Azerî, Belûcî, Ereb, Tirkmen jî dikare zemîneke baştir çêbike.

Li gorî şerdên heyî yên Rojhilatê Kurdistanê, gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê, ji aliyekî ve têkoşîna ji bo azadîya Kurdistanê dimeşîne; ji aliyekî jî dixwaze vê têkoşînê, bi gelên Faris, Azerî, Belûcî, Ereb, Tirkmen ra ji bo şîrîkatîyeke li ser esasê federalîyê û demokrasî ya li Îranê bimeşîne. Ji ber vê rastîyê, bi hev ra xebata hevbeş ya bi gelên din ra girîng e.

Navenda Hevkarîyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê, partiyên Kurdistanê, şerd û rewşa Rojhilatê Kurdistanê û hêz û rastîya xwe û ya gelê me baştir dizanin. Ji ber wê jî em wek partiyên li perçeyên din ên Kurdistanê, nabe ku tedaxulî karê wan bikin û rê û stratejiyan li ber wan bixin. Em divê piştgir û alîkarên wan bin, karê wan hêsantir bikin, barê wan girantir nekin û divê em bi pêşniyarîyên xwe yên çêker li gel xuşk û birayên xwe yên Rojhilatê Kurdistanê bin.

Tiştê ku diyar e, partiyên Rojhilatê Kurdistanê, ji bo ku van xwepêşandanên sîvîl ên gelê me bi midaxaleyên çekdarî ji armanca xwe dûr nekevin û rê ji êrîş û provokasyonên Dewleta Îranê ra rê xweş nebe, nuha xwe ji şerê pêşmergeyatiyê yê li nav bajarên dûr dixê. Ev jî bi ya me siyaseteke maqûl û rast e. Lê helbete ku ev nayê wê wateyê ku, dê mafê xwe yê meşrû yê parastinê bikar neynin.

Partiyên Rojhilatê Kurdistanê helbete ku divê xwedîyê plan û stratejiyekê bin ku, dê vê serîhildana gelê me bi çî awayî û bi çî armancên demkî û dûv û dirêj organîze bikin. Divê xwedî siyasî û bernameyekê bin da ku bikaribin gelê me ji îro pê ve zêde zerarê nebînin, ev serîhildan bibe binhega hûnandina toreke xurt a ku bi hişmendîyeke neteweyî û niştimanî ve hatîye hûnandin. Divê ev

»»»Doma R:4

serîhildan bi êrîşên Dewleta Îranê şikestekê û bêmoralî û bêhêvîyekê bi xwe ra neyne, bibe bingeheke xurt ji bo bideştixistina mafên neteweyî, demokratîk.

Navenda Hevkarîyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê pêngaveke gelekî girîng, niştimanî û dîrokî ye. Partiyên Rojhilatê Kurdistanê yên neteweyî û niştimanî, çiqasî bikaribin hevkarî û tifaqa xwe ya li Rojhilatê Kurdistanê berfirehtir û xurtir bikin, dê ewqas zêdetir bikaribin gelê me organîze bikin, birêxistin bikin û dê bikaribin ji êrîş û xeterîyan biparêzin.

Hevkarîyeke berfirehtir ya neteweyî, niştimanî herweha di dema guhertin û midax-

aleyên dewletên cîhanê yên li herêmê da, dê zêdetir amade be ku ji firsendan feyde werbigire û dê zêdetir bika-ribe gelê me ji guhertinan ra amade bike, organîze bike. Partiyên Rojhilatê Kurdistanê yên neteweyî û niştimanî, ji her demê zêdetir divê xebat, çalakî û peywendîyên xwe yên nevweteweyî, dîplomasi xurtir û organîzetir bikin. Dinya ew دنیا ye ku, di guhertinên navxweyî da jî, gelek caran midaxaleyên der-ekî, ji rûdan û hêza navxweyî zêdetir tayînkir dibin.

Gelê me yê li Başûr ,Bakur û Rojava, li gorî diviyabû piştgirîya xuşk û birayên xwe yên Rojhilat nekirin Di encamê da ez dixwazim , Kurd û Kurdistanîyên li Bakur û Başûr û Rojavayê Kurdistanê jî rexne bikim û li

ser navê xwe û navê partîya xwe ji xuşk û birayên xwe yên Rojhilatê Kurdistanê lêborînê dixwazim. Me wek Kurd û Kurdistanîyên li her sê perçeyên din wazîfeya xwe ya piştgirî û alîkarîya vê serîhildana gelê xwe yê Rojhilatê Kurdistanê bi şeweyeke ku pêwîst bû û di- viya bû bihata kirin, me bicîh neanî.

Bi taybetî HDP ya ku ji 6 milyon Kurdên Bakurê Kurd- iştanê û Tirkîyeyê denga digire, dikaribû bi awayekî girseyî piştgirîyeke mezin bikira, lê nekir.

Her çiqas hêzeke wan a girseyî tune be jî, lê partî, rêxistin, grûp, dezgeh û kesayetên Kurdistanî yên li Bakurê Kurdistanê jî mixabin tiştên ku dikaribûn û divîya bû bikirina , bi aweyî pêwîst

û diviya bû bikirina nekirin. Li Rojava û li Başûrê Kurd- iştanê bi sedhezaran gelê me dikaribûn bi organîzasyonên sivil piştgirîya gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê bikirina, lê mixabin nekirin.

Divê em wek Kurd û Kurd- iştanîyên Bakur û Başûr û Rojava, di vê derbarê da li xwe vegerin, vê kêmayîya xwe tesbît bikin , xwe rexne bikin û bêjin ‘‘Lê hîna jî ne dereng e, em ji îro pê ve jî di- karin bi şeweyên cuda cuda û bi girseyî piştgirîya gelê xwe bikin, wazîfeya xwe ya neteweyî bicîh binin’’.

04.10.2022

Mustafa Ozçelik

Serokê Giştî yê PAKê

Navenda Mafê Mirovan a Îranê; Heta niha herî kêr ١٨٢ xwenîşander li Îranê hatine kuştin

Di 19emîn roja xwenîşandanên xelkê seranserê Îranê yên li dijî herîfîna rejîmê de, saziyên mafê mirovan, dane zanîn ku herî kêr 182 hevwelatîyên xwenîşander yên Îranê li bajarên cuda yên Îranê hatine şehîdkirin.

Roja Çarşemî 13ê Rezberê, Navenda Mafê Mirovan a Îranê, bi rohnûna nava, lîsteta kesên ku di xwenîşandanên Îranê de hatine kuştin belav kir û ragihand ku heta niha nasnameya 182 xwenîşanderan li seranserê Îranê hatiye rohnkirin ku di nav wan de tenê 88 kes di nav xwenîşandanên Zahedanê de hatine kuştin.

Piştî vê ku Spaha Pasdaran, besîc û hêzên polîs ên Îranê nimêjkerên Mizgefta Mekkî ya Zahidan dane ber gulleyan, şer û pevçûn di navbera wan û xwenîşanderan de çê bû ku gelek hevwelatî- yên Belûç rijiyane ser şeqaman, lê Spaha Pasdaran ew dane ber gulleyên raşterast û zêdetirê 80 kes hatine şehîdkirin.



Saziya Mucahidînin Xeliq pitevanî li mangirtina seranserî ya roja Şemî 9`ê Rezberê kir

Saziya Mucahidînin Xeliq di peyamekê de piştevanîya xwe li bangêjiya Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê ya bi mebesta birêvebirina mangirtina seranserî ya roja Şemî 9`ê Rezberê ragihandin.

Di peyama Saziya Mucahidînê Xeliq de hatiye, mangirtina seranserî ya roja Şemî 9`ê Rezberê piştevanî jê dike û êrîşên Spaha Pasdaran a terorîst ya li ser binke û navendên partiyên Kurdistanê Îranê yên li Herêma Kurdistanê şermezar kir.

Navenda Partiyên Kurdistanê Îranê di bangêjiyekê de ragi- handin ku roja Şemî 9`ê Rezberê mangirtina seranserî ya li dijî rejîma Îranê dê bê lidarixistin. Û herwisa Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê ji tev xelkê Kurdistan û Îranê ku ji her reng û texeke ne daxwaz kir ku bi lidarxistina mangirtineke pan û berfireh, tevî vê xebatê bibin û êrîşên rejîma Îranê ên li dijî partiyên Kurdî yên Îranê yên li dijî rejîmê li Herêma Kurd- iştanê de şermezar bikin



Nîka Şakirî ji aliyê rejîmê ve hate kuştin\ Rejîm gefan li malbata wê dixwe

Nûçegihaniya “Tasnîm” a girêdayî Spahê Pasdaran roja Çarşemî 13`ê Rezberê vîdyoyek çêkirî belav kiriye û dibêje dawî vîdiyoya Nîka Şakirî ye ku li nav xwenîşandana nebûye.

Hêzên rejîmê gef li malbata navbirî xwarine ku divê rabigehînin Nîka bi sedema teqeya hêzên rejîmê nehatiye kuştin û heta di nav xwenîşandanan de jî beşdarî nekiriye, wê xwe ji avahiyekê re avêtiye xwarê û dawî bi jiyana xwe aniye.

Eva jî di halekeê de ye pêka nameya goristana “Biheşt Zehra” a bajarê Tehranê “Nîka Şakirî” bi sedema berketina derbên giran canê xwe ji dest daye.

Herwisa dayîka wê jî ragihandiye ku “Nîka” bi mebesta beşdarîkirin di xwenîşandanan de ji mal çûye derê û di dawî pêwendiya telefûnî de ragihandiye ku hêzên rejîmê li pey wê ne.




Amerîka: Îran dê tawanên giran bide

Berdeвка Koşka Spî, “Kerîn Jan Pîr” bi îşarekirin bi nîgeraniyên dewleta Amerîkayê derheq tepeserkirina bi tundî ya xwenîşandanên aştîyane li Îranê daye zanîn: “Emê dê berdewam bin li ser danîna cezayên zêdetir li dijî berpirsên tepeserên Îranê yên ku xwenîşander li Îranê kirine armanc.”

Berê jî “Joe Biden” hevxiyaya xwe bi xwenîşanderên Îranê re ragihandibû û diyarî kiribû: “Amerîka digel jin û hevwelatîyên Îranî ye ku bi netirsiya xwe dibine mînak bo cîhanê.”

“CNN”ê jî pêka çavkaniyek agehdar ragihandibû ku tê çavniherîkirin ku dewleta Amerîka dê li wê heftiyê berpirsên ewlehî yên rejîma Îslamî ya Îranê û wan kesên ku di tepeserkirina xwepêşandanên xelkê Îranê de rol hebûne, tehrîm bike.




Xwanîşandanên dersxwan xwandekaran yên li dijî qetlên hikûmetî yên hêzên serkutker yên rejîma Îslamî berdewam in

Roja Sêşemî 12`ê Rezberê li piraniya bajarên Îranê yên weke Kerec, Zencan, Tehran, Seziq, Urmiye Mehabad û hwd, dersxwan û xwandekar rîjyane ser şeqaman û li dijî serkutkarî û qetlên hikûmetî yên rejîma Îslamî xwenîşandanên berfireh lidar xistin.

Di wan xwenîşandan de dersxwan û xwandekaran siloganên weke, “elîtên me kuştin û axûnd bichê danîn” dan û xavikên xwe jî havêtin.

Di 18emîn roja xwenîşandanên seranserî de xwandekarên zanîngeha El _ Zehra ya Tehranê rîjyane ser şeqaman û li dijî serkutkarî û dirindehiyên hêzên serkutkar yên rejîma Îranê û hêzên besîc û Spaha Pasdarana terorişt silogan dan.

Tevî qutkirina hêla internetê ji aliyê karbideştên rejîma Îslamî a Îranê ve, duh dersxwan û xwandekar û bazariyên piraniya bajarên Îranê rîjyane ser şeqmanan û bêzariya xwe li rejîmê nîşan dan.



Nerîna Lîderan



“Josep Burrell:”

Rayedarên rejîma Îslamî ya Îranê divê li derheq qetla Jîna(Mehsa) Emînî de bersivê bidin



“Hajal Hebîb:”

Wezîrê Derve yê Belçîkayê ez bi mirina Jîna(Mahsa) Amînî matmayî me.



“Melewi Abdul Hemîd:”

Ne “Ceyş el-Adl” û ne jî tu grûpeke din di qetlîama gelê Belûç de rol neliştin.



“Eli Fedawî:”

“Çigirê fermandarê pasdaran: temenê navincî gelek ji wan girtiyan 15 sal e”.

Êrîşa balêstîkî ya li ser sivîlan nîşan da Îran bombeya Etomî dixwaze!



N: Eskender Ceiferî

Di heyamên derbasbûyî de rejîma Tehranê careke din êrîşî ser baregehên partiyên Kurd kir û di encamê de bi dehan sivîlan şehîd bûn. Ew êrîş, bi mûşeka balêstîk bûn û zêdetirî berê nîşan dide ku rejîm bombeya Etomî dixwaze.

Ev jî di demekê de bû ku rejîma Îranê careke din îdiayê ku ew bombeyê naxwazin û wê piştî heyameke din, careke din Danûstandinên Etomî deşt pê bikin.

Di dema deşthilatdariya Hesên Rûhanî de, roja 14ê Reşemeya 99’an, Mihemd-ceedad Zerîf wezîrê derve yê rejîma Tehranê ragihand ku êdî rêkeftina Etomî ji aliyê wan ve nakeve ber bas. Ev jî di demekê de bû ku welatên Berîtanya, Feranse û Alman-yayê ragihandibûn ku ji bo nîşandana niyazpakiya xwe, reşnivîsa li dijî Îranê nadin Ajansa Navdewletî ya Etomê. Lê niha piştî êrîşa ser Kela Dêmkokrat û partiyên din, dîsa metirsiyên vê rejîmê xuya dibin.

Hejmarek ji parlamenterên Almanî ragihandin ku me li vir li parlamentoya Almanya gotûbêj û nirxandina mijaran dikir û hevdem jî rejîma Îranê bi dronan êrîşî ser cihên sivîlan li herêma autonomî ya Kurdistana Îraqê kir. Pêwîstiya Ewropayê bi stratêjiyeke nû li hemberî Îranê heye. Ev gelek sal in ku li Îranê bin-pêkariyên berfireh ên mafên mirovan çê dibin û lewma em nabe li ser mijara rêkeftina Etomî bi axivîn.

Piştî ku rejîmê got ew dîsa rêkeftinê dixwazin, Donald Trump serokkomarê berê yê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê dewsa xwe da Joe



Biden û dihat pêşbînîkirin ku dewleta Biden vegere ser gotûbêjan ji bo rêkeftina etomî bi Îranê re. Di vê navberê de Rêformxwaz heftim dibêjin rêkeftinê dixwazin lê Sipaha Pasdaran dibêje nabe rêkeftin bê kirin.

Di rastî de armanca rejîma Tehranê berhemanîna bombeya etomî ye. Ew, demê bi kar tînin û bi meyndina Oranyoma zêdetirî 20 jî sedî, nêzikî berhemanîna bombeyê dinbin.

Niha dewleta Biden jî dixwaze rê li ber Îrana Etomî bigire û ragihandîye ew dixwazin ji bo rêgirîkirin ji berhemanîna bombeyê ji aliyê Îranê ve her karî bikin.

Îsraîl jî bi Amerîkayê re hevnerî e û dibêje nabe Îran bibe xwediya bombeyê. Komara Îslamî jî bersiva berpîrsên Îsraîlî û Amerîkî dabû û gotibû: Wê cihan wan gunehbariyên ku rayedarên Îsraîl dike, ji bîr neke. Piştî ku Donald Trump peymanî etomî ya bi Îranê re bi tundî rexne kir, Rex Tillerson wezîrê Derve yê Amerîka jî xwest rêkeftina etomî ya bi Îranê re were guherandin û jinûve were nivîsandin lê ji bo razîkirina Îranê ew libenda piştgirîya hevalbendên xwe yê Ewropî ne. Tillerson got jî ku xelên rêkeftinê têra xwe tund nîn in û rê li ber bernameya etomî ya Îranê nagirin ji ber vê jî ewê cara yekê bi Cevad Zerîf hevtayê xwe yê Îranî û wezîrên derve yê welatên ku peyman îmza kirine re, bicivîn û mijarê gotûbêj bikin. Wê demê Sergey Lavrov Wezîrê Derve yê Rûsyayê ku ji bo Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li New Yorka Amerîkayê bû, li ser helwesta Amerîkayê

ya di derbarê Îranê de dabû xuyakirin ku helwesta nelihevkerî ya Donald Trump serokkomarê wê demê yê Amerîkayê ya derbarê Îranê de û rexnekirina bernameya etomî ya Îranê cihê fikarê ye. Feranse, Berîtanya û Almanya difikirin ku eger Îrana Etomî bikeve Rojhilata Navîn, ewê pêgeha xwe ji deşt bidin. Lewma jî reşnivîsa li dijî Îranê nedan Ajansa Navdewletî ya Etomê ji bo ku niyazpakiya xwe nîşan bidin û Îranê vegerînin ser maseyê. Lê bi daxuyaniya Zerîf, derket holê ku êdî Îran rêkeftinê naxwaze.

DYA bi raportên çalakiyên etomî yê Îranê re bi baldarî riftarê dike û gotara wezaretê Derve ya Amerîkayê hemû wan pirsyan bersiv nade ku çima Amerîka di îmzekirina raportan de dudil e û sedem çî ne lê bi gotara Hesên Rûhanî zelal dibe ku dorpêçên nû yê aborî, gefê li rêkeftinê dikan. Rêkeftina etomî di roja 14ê Tîrmeha 2015an de bi tevlibûna welatên ewropî hatibû îmzekirin û li gora wê, Îranê hin çalakiyên etomî kêmkirin û di hember de jî dorpêçên aborî li ser Îranê dihatin kêmkirin.

Îsraîlê jî deşt pêkê ve ragihand ku ew, vê rêkeftinê naxwazin. Beriya niha jî berpîrsên saziya Nehêlana Çekên Etomî ragihandibûn her qasî ku Îranê bi hemû wan welatan re lihev kiriye, lê çavên Ewropîyan li Amerîkayê ne. Her biryarekê ku Waşington diştine, ji wan re dibe bandor. Berîtanya hewl dide DYA razî bike ku raportên li ser çalakiyên etomî yê Îranê demlîdest îmze bike lê Trump li pey planeke din digere.

Ji bilî berpîrsên bilind ên Îsraîlê, fermandarên wan jî didin xuyakirin ku eger rêkeftin bê kirin, Îrana Etomî, wê Rojhilata Navîn dagir bike. Li bendê ye piştî êrîşa balêstîkî ya rejîmê li ser sivîlan, Rojava li biryar û kiryarên xwe li hemberî rejîmê vegere.

Şoreşa (Jîna Emînî) sînorên Îranê derbas dike



N: Ebdûlazîz Qasim

Xuyaye ku serhildana xelkê Îranê û Rojhelatê Kurdistanê li dijî rêjîma Îranê ya mirovkuj û ştemkar roj bi roj berfirehtir dibe û bi taybetî ku nerazîbûna tevaya xelkê Îranê li dijî hovîtiya rejîmê, piştî şehîdbûna keça Kurd (Jîna Emînî) zêdetir bûye, tevî xwepêşandanên xelkê Îranê yên li diasporayê û bi taybetî li Ewropa, Amerîka, Brîtanya û Keneda .. hd.

Tiştê niha diqewime, bi awayekî serekî ji encama têkçûna rewşa guzeran û ji-yana xelkê Îranê ye û herwisa ji encama siyaseta serkutkar ya vê rêjîmê ye, ku bi dirêjahiya 43 salan, bi siyaseta mirovkuj "kuştin û bidarvekirin" serederiyê digel xelkê azadîxwaz yê Îranê dike, bi taybetî li dijî gelê kurd siyaseta jinavbirin û asîmelsyonê pêrew dike, zêdebarî destdirêjiya wê di nav karûbarên dewletên herêmê de û piştevaniya gelek rêxistinên terorîst li Sûriya, Lubnan, Îraq, Yemen û Fîleştînê, hevdem ligel êrîşên wê yên berdewam li ser xaka Herêma Başûrê Kurdistanê, bi taybetî êrîşên wê yên vê dawiyê bi rêya firokeyên bêfirokevan û mûşekên balîstîkî.

Eşkereye ku rêjîma Îranê ti bersivê yan bijardeyek bidest nîne ji bo bersivdana daxwazên xelkê Îranê ji bilî kuştin û serkutkariyê û gunehbarkirina xelkê serheldêr bi xiyamet û pêwendiyên ligel Amerîka û Îsraîlê, ku ev gotar îrojî di daxuyaniyên Xamîneyî, Rayîsî û rayedarên payebilind yên rêjîma Îranê de xuya dibe, ku bi dirêjahiya 43 salan bi tenê bi kuştinê bersiva serheldêr û azadîxwazan hatiye dan, çawa dibînin ku di heyamê çend rojên



borî de bi dehan xwepêşander li deverên cuda cuda li ser deştê hêzên ewlekariya rêjîmê hatine şehîdkirin û bi taybetî li Rojhelatê Kurdistanê û Beloçîstan.

Ji aliyekê din, xuyaye ku rêjîma Îranê bi bedxwazî û fêlbazî serederiyê "reftarê" digel serheldanê dike, ku serederiyek cuda digel xwepêşanderên Faris û Azerî û Ereban dike beramber serederiyek tundtir li dijî gelê Kurd û Beloç bi taybetî li dijî Herêma Kurdistan, bi armanca çêkirina duberekiyê di nav xwepêşanderan de û herwisa ji bo bidestxistina razîbûna neyarên gelê Beloç wek Pakîstan û neyarên gelê kurd ji bo bidestxistina piştgiya dewletên dagîrkerên Kurdistanê, herwisa ku îro ji bo serkutkirina serheldanê li ser asta navnetewyî, tê çaverêkirin ku rêjîma Îranê destdariyek bêwêne "îmtiyazên mezin" li ser bername xwe etomî pêşkêşî Ewropa û Amerîka bike, zêdebarî pêşkêşkirina gerentiyên ewlehî bo Îsraîlê, ku razîbûna Hizbulah li ser diyarkirina sînorê deryayî di navbera Îsraîl û Lubnanê de dikeve di heman çarçoveyê de.

Bi dîtina min ku hesabên berê yên herêmî û navdewletî piştî şerê Rûsiya û Ukraynayê hatine guhertin, bi taybetî ku nêrînên cuda li Amerîka li ser bernameya etomî ya Îranê di navbera Komarîxwaz û Demokrat de hene, bi taybetî ku rêkeftina etomî bi awayekî raasteraşt wê bikeve di xizmeta bihêzkirina aboriya rêjîma Îranê û zêdekirina hejmongerî û destdirêjiya wê de, lê dîsa biryara dawiyê di deştê xelkê Îranê de ye, û helbet ku digel berdewamiya serheldanê û hez û îradeya gelê Îranê bo azadiyê, dê hesabên nû bikevî rojevê û dê hevkeşeyên navdewletî û herêmî jî bibe guhertin berbi serkevtina serheldanê û herweha tê çaverêkirin ku serheldan ji sînorê Îranê derbas bibe berbi serheldaneke herêmî ya berfireh bi beşdariya tevaya gelê kurd û xelkê azadîxwaz yên Îraq, Sûriya û Lubnanê jî li dijî hejmongeriya vê rêjîmê serkutkar û milîsên wê yên terorîst, nemaze ku xwepêşandanên girsayî li Îraq û Bexdayê her ji cotmeha 2019'an ve li dijî alîgirên Tehranê li Bexda heta îro berdewam dikin, û helbet ku şikeştina rêjîma Îranê dê bikeve di berjewendiya hemû milletên Rojhelata navîn de û dê bibe fakterê peydabûna ewlehî, seqamgerî û pêşkevtina vê navçeyê.



“BILA EV KUŞTÎN, KUŞTÎNA ME YA DAWÎ BE”



N: Nuran Koyuncu

Îran ji berê ve li ser Kurdan wek rejîma îroyîn sîyaseteke dagirker, jenosîdkar, gefxwer û zordest didomîne. Bi ser de bi hîcabê ve ji bo jinan jî dibe xofeke mezin.

Di diroka Îranê de hem beriya mollayan û hem piştî mollayan ji bo jiyaneke azadî, ji bo nerazîbûna şert û mercên demê jinên nerazîbûn li dijî zagonên ku zêfandina jiyana jinan kirine gelek xwepêşandan pêkanîne. Mînak, di sala 1997 an de bi tenê hezaran jin li Tehranê dagirî li Qada werzişê ya Azadîyê dikin û li dijî qedexeya temaşekirina pêşbaziya werzişê ya jinan derdikevin. Xwepêşandaneke pir mezin pêk tînin û dikevin di qadê. Piştî tê ketina qadê hebûna xwe nîşan didin û tevî şahiya tîma gogpiyê ya neteweyî dibin. Digel hev serkeftina tîmê pîroz dikin. Bi vî awayî di dema Serokkomar Hatemî de vê qedexekirinê ji holê radikin. Wek vî mînakê li Îranê ji wê demê heta îro jinan li dijî qedexebûna serkutê angî hîcabê jî xwepêşandanên navdar pêk anîne. Lê, ne wekî ya Jînayê hem li Îranê hem li seranserê dinê berbelav bûne, bi ewqasî neketine rojeva dinê, bi ewqasî deng venedane û polîtîk, bibiryar, bi domdar ne bûne.

Di nav wan xwepêşandan û bizavan de ya sereke di sala 2017 an de 28ê meha Çileyê Pêşin/Befranbarê pêk hatiye. Wê rojê jineka navê wê Vida Movahed di kolana Eng-helabê ya Tehranê de bi serê şivekê şerpaka spî dihejîne,



bi vî şeweyê ve bi zorê serî girtinê şermazer dike.

Bi demeke kurt li seranserê Îranê gelek bajaran ev bizavî deng vedide. Bi sedan jin li cihê xwe şerpa bi şivekê ve daliqiyayî ya spî dihejin û wêneyan dikşînin. Li wan wêneyan jî li ser medya civakî belav dikin. Bi dewamiya vê bizavê bi banga Masih Alinejad ve tê. Alinejad rojnamevaneka rikeber e, li dijî rejîma mollayan e. Di sala 2014 an de bona li dijî derketina hîcabê di erebeya xwe de, di hatinûçûnê de serkut wêneya xwe dikşîne li ser facebookê diweşîne.

Jê pê ve bangê jinan dike dibêje” wêneyên xwe yên serkot li ser facebookê di vê rûpela”azadiya min e nepenî” de biweşînin. Bi vê bangê ve 30 hezar jin bi serkot wêneyên xwe di demeke kurt de diweşînin û Alinejad jî bi vî hawî navdar dibe tê nasîn. Disa di heman salê di meha Gulanê de bi rêya medya civakî icar her Çarşemê bangî li xwe kirina şerpa an jî cil û bergên spî dike. Divê bi wan cil bergan biçine li sazîyên fermî û nerazîbûna hîcabê bi vî awayî diyar bikin.

Di heman demê de hezaran jin li ser medya civakî di bin hashtagên “Çarşema Spî” nivîs û wêneyên xwe parve dikin. Ew bizav li nav civakê piştgirî dibine. Bi navê “Çarşema Spî” deng dide û tê nasîn. Di dirokê de cî jî digre.

.Kuştina Jînayê agirê hişmendiya nerazîbûnê careke din kûr û har dike.

Ev 19 ê roj in jin, bi taybet jinên ciwan pêşiyê yên rojhilatê Kurdistanê paşê deverên din piştî kuştina keça kurd a navê Jina Emini, bi banga rêxistinên hevpar ên rojhilatê Kurdistanê ya sekinandina karkirinê ve wa ye dîsa derdikevin li kolanan. Di heman demê de li seranserê Îranê bi sedan xwepêşandanên pêk tînin. Icar li dijî kuştina Jîna/Mahsa ku hêncata bin pê kirina şert û mercên sergirtina jinan ya bi şerpayê (bi Farsî hicab) ya Jînayê derdikevin, serî hildidin. Ku ew hêncet dibe sedema kuştina Jîna/Mahsa Emini.

Jîna di 16 Îlona 2022 an de çima ku serê baş ne nixumandiye êrîş û tehdêya hêzên exlaqê yên rêberîkirinê dibe û tê kuştin.

Xwepêşandanên bi navê şermandina Jînayê êdî ber bi serhildanê diçe li seranserê Îranê doza ‘Azadîyê’ tê kirin û heya navê şoreşê jî tê hildan. Doza ku tê kirin dê çawa bi rêve bibin û pêvajoya wê dê çawa bidome ev hêj nediyar e.

Banga xwepêşandanên li nav farisiyan, beluciyan û eceman (ezerî??) deng veda. Vêga mollayan piştgiriya kurdan tîk nebiriye. Lewma bi zora çekan bi zora kuştinê dixwaze kurdan têxe rêze û

yên din re jî çavtirsîyê bike. Xwepêşandanên tîk bibe û kurdan di bin zexta xwe de qir bike. Lewma her roj bi sedan însanên kurd li kolanan, li malan direvînin rewş û cihê wan diyar nakin. Dengê azadiyê li her bajaran tê. Her kes doza wê dike. Lê azadî. serxwebûn beriya giştî ji bo kurdan hewce ye. Ji ber ku kuştina Jînayê careke din ev hewcedarî bi bîr aniye.

Kûl û derdên kurdan, jenosîda kurdan bê dewletbûna kurdan nîşanê me, nîşanê dinyaya bê deng daye. Agirê serhildaneke “Bila ev kuştin, kuştina me ya dawî be” pêxistiye. Roja Îroyîn hikûmeta Îranê hêj nahêle kurd ji zarokên xwe re navê kurdî daynîn, lewma mixabin keça kurd Jîna li dinê bi navê ‘Mahsa’ ve hatiye nas kirin ne bi navê xwe yî Jînayê. Ji ber ku Mahsa navekî bi farsîyê, dewletê bi zorê daniye keça kurd.

Jîna û cangoriyên xwepêşandanên êdî sembolên azadiyê ne. Divê ji vê gavê zêdetir bê avetin ku rewşa kurdan bê guhertin. Hêjayê mereqa li wan du pirsan in ku pêvajoya xwepêşandanên çawa bidome:

Li Rojhilatê Kurdistanê hevkariya rêxistinên bi wan sembolan ve dê çawa ber bi şoreşê biçin?

Li hêzên dinê angî dewletên bi hêz piştgiriya kurdan bikin an nekin?

Silêman Keleşî: “piştî qetilkirina Jîna Emînî û serhildana xelkê Kurdiştan û Îranê zirof bi tewawî hate guhartin û xebat û berxweSilêdana xelkê derbasî qonaxe nu bû”.



Silêman Keleşî

Min digel rêzdar Silêman Keleşî pêşmerge berê yê hizbê û endamê niha yê Hizbê li derveyê welat hevpeyvînek li ser rewşa serhildana nû ya Îranê hevpeyvîn pêk anî û wî got: “piştî qetilkirina Jîna Emînî û serhildana xelkê Kurdiştan û Îranê zirof bi tewawî hate guhartin û xebat û berxwedana xelkê derbasî qonaxe nu bû”.

1: Gelo vê destdrêjiya rejîma Îranê li ser axa Herêma Kurdiştanê û mûşekbarana binkeyên Partiya Demokrat hûn çawa dinirxînin?

Diyare ev kiryarên wisa hovane li hikumetên dîktator û dijî gelî yên wek komara Îslamiya Îranê ku hîç sînoreke mirovatî û navdewlatî bo man û zerbe lêdan li neyarê xwe nasnake, bo meyên ku salanê sale dijî wê Rejîma hov xebat û berxwedanê dîkin, mûşekbarana axa Herêma Kurdiştanê û binkeyên Partiya Demokrat a kurdiştana Îranê û hêzên dinêye rojhelatê Kurdiştanê demeke wisa de gelek ecêb û ciyê ser sormanê nine. Her wek dizanin ku piştî kuştina keça Kurd Jîna Emînî bi destê Rejîma Îranê, li ser bangewaziya Navenda Hevkarî ya hêzên Rojhilatê Kurdiştanê baykot û serhildaneke mezin dijî Rejîma Îranê li rojhilat û li piştê jî hemû Îranê de dest pêkir û rejîma Îranê li binîwe hejand û bêhna wê teng kir.

Ez dikarim bêjim ku li van 43 ê salê derbaz bûy de qet komara Îslamî wisa neketiye xetera navçûnê û xîmê wê nehejyaye. Li demeke wisa de ku Rejîma Îranê li navxwe yê welat û li derveyê welat, her wisa li aliyên Rêkxistinê navnetewey û welatên cîhanê we tete guwişandin, mehkûm û rezîl kirin, berhîndê ye ku Rejîma Îranê dîn û har bûye û raşte raşt agir li ser xelikê sîvîl de dibarîne û dikuje û herwisa jî Herêma Kurdiştanê û bargahên hêzên Rojhilat mûşekbaran dike.

2: Gelo rejîma Îranê pişt bi kîjan hêzekê girê dide ku niha gefa êrîşkirina li ser xelkê sîvîl ku di nav axa welatek dîn de penaberin ji xwe re mafek rewşa dibîne?

Her wek min li bersiva pîrsa pête jî bas kir ku Rejîma Îranê çî sînorek exlaqî, dewletî û navdewletî bo girîng nine. Ber hindê jî Rejîma Îranê mifahê li wî zirofê perîşan û nacêgire îro ye Iraq û herêma her wisa şerê Ukrayn û Rûs ku bûne hegerê sefbendiyeke taze a siyasî, Eskerî û Okonomî li Cîhanê da, Rejîma Îran jî dixweze li zirofekî wisa de mifahê werbigre û zerbê li hêzên dijber xwe û heta xelkê sîvîl û penaberan jî bide. Ew hêrişane jî ne bi hêz bûna Rejîma Îranê ye, belkî ewa li zeîf û zelul bûna wê Rejîmê nîşan dide.

3: Rêzdar Silêman xwenîşandanên niha yên seranserî yên Îranê ku birêve diçin ci cudahiyek digel xwenîşandanên berê hene? Bi dîtina min meş û raperîna wê carê digel hemû xwenîşandanên 43 ê salê derbaz bûy yên dijî Komara Îslamî Îranê ferq û ciyawazî heye. Her wek dizanin heta niha gelek xwenîşandan hebûne, lê çî ji van xwenîşandanên nekarîn hemû qatê civakê û neteweyên bindest yên Îranê bigre ber xwe yan jî nav xwe. Xwenîşandana wê carê li Kurdiştanê we dest pêkir û seranserê Îranê girt û herwisa



piştgîriya kesayetiyê naskirî li hemu aliyekî ve, wek nivîser, hunermend, werzişvan, mamoştayan û digel xwendkarê zanko û ... hwdç xencî wê hindê ku yekîtiya wê carê dinav xweyê welat û neteweyên bindest bê hempa bû, li derwey welat û hemu Cîhanê jî gelê me hemaheng digel gelê dinêye Îran ser pêyan li qatan bûn. Ciyawaziyeke dinê jî ewaye ku wê carê Rêkxistinên mafê mirov û navdewletî û her wisa dewlet û kesayetiyê Cîhanî piştgîriya wê raperîne kirin û li eynî demeê da jî kiryarê hovaneyê Rejîma Îranî dijî xelikê sîvîl û bargahên hêzên Rojhelat li Herêma Kurdiştan bi giştî û kuştin keça Kurd Jîna Emînî ku niha bûye sembola wê raperîne mehkûm û şermazar kirin û gelek ferq û ciyawaziyeke din ku renga li nivîna kort de cî nebe.

4: Gelo serhildana xelkê Kurdiştana Rojhilat û Îranê li hember qetilkirina Jîna (Mehsa) Emînî bi destên hêzên serkutkar yên rejîmê û mangirtina seranserî, çî encamekê li ser vê pêvajoyê çê bike?

Ya raştî piştî qetilkirina Jîna Emînî û serhildana xelkê Kurdiştan û Îranê zirof bi tewawî hate guhartin û xebat û berxwedana xelkê derbasî qonaxe nu bû. Ez bawer nakim Rêjîm reforma bike û xwe biguhare, berhîndê ev yek li zatê wê rejîmê nine. Lê ya girîng ewe ku xelkê rêya xwe peyda kiriye û xîmê rejîmê leq kiriye, lê ya zor hewce ewaye ku rêberiyek jîr



û xorte bo rêberî kirina seran serî Îranê ku bikare wek Rojhelatê Kurdiştanê pêşengiya xebat û serhildana gel bike. Hêvîdarim ku hêzên siyasiyê Kurdiştanê bikarin digel neteweyên bindest û hêzên sertaserî ê Îranê wê rêberiyê pêk bînin.

5: Gelo mirov dikare bêje ku bi kuştina Jîna Emînî gelên cîhanê rejîma serkutkar ya Îranê baştir nas bikin?

Belê, gelên cîhan bi giştî û desthilatdarên van bi xasmanî baş Rejîma Îranê nas dîkin, lê her kes û alî gorî berjewendiyên xwe û welatê xwe tew digerin. Her dibînin dema dengê xebat û serhildanê li nav xweyê welat da dijî Rejîma Îranê bilind û xortir dibe, deng gelên cîhan û dewlatan jî bilind dibe. Naskir û nenaskirina Rejîma Îranê girêdaye bi kar û xebata ku em dîkin.

Li dawiyê dibêjim riha hemu şehîdên rêya azadî û serbestiyê bi giştî û Jîna Emînî sembola wê serhildanê bi xasmay şad be.

Silav li xelkê qehremanê Rojhilata Kurdiştanê ku pêşengiya xebatê dijî Rejîma Îranê li hemû Îranê de dike.

Emê bi yekîtiya xwe serkevin. Bijî Kurd û Kurdiştan.

spas bo we kek Silêman Keleşî ku we dema xwe bo rojnameya Agirî terxand kir

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

“Se’îd Şêrzad” girtiyê siyasî yê berê digel birayê xwe hatin binçavkirin

Roja Yekşemî 10ê Rezberê, “Se’îd Şêrzad” girtiyê siyasî yê berê digel birayê xwe yê bi navê “Elî Şêrzad”, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatin binçavkirin û piştê bo cihek nexuya hatin veguhaştin.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, demjimêr 2ê paşnîvroya roja Yekşemî 10ê Rezberê, hêzên ewlehî bi nîşandana belgeya binçavkirinê “Elî û Se’îd Şêrzad”, êrîşkirine ser mala wan û piştî vekolîna mala wan, hemû kereştîyên kesî yên wan ku pêkhatine ji du keys, teblêt û telefonên hemû endamên malbatê digel xwe biribûn.

Herwisa wê çavkaniyê got: Hêzên ewlehî di deştê de Elî û piştê Se’îd binçav kirin.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê, ji sedema binçavkirin û cihê ragirtina Elî û Se’îd, ti zanyariyek ber deşt nîne.

Roja Şemî 13ê Banemera sala 1399’an a rojî, “Se’îd Şêrzad” piştî bi dawîhatina heyama girtîgeha wî, ji girtîgeha Recayî Şehr a bajarê Kerecê, hatibû azadkirin.

Nûciwanekî nerazî li bajarê Urmîyê canê xwe ji deşt da

Roja Çarşemî 13’ê Rezberê, nûciwanekî Kurd ê bi navê “Nîma Şefeqdoşt” yê temen 16 salî û kurê Bêhroz û xelkê gundê “Zindeşt” yê ser bi bajarê Selmasê û rûniştîyê taxa “Kuştargah” a ser bi bajarê Urmîyê di meşa kombûnên nerizayetiye yên bajarê Urmîyê ku bi sedema teqeyê bi awayekî dijwar hatibû birîndarkirin, di yek ji girtîgehên ewlehî yên rejîma Îranê de canê xwe ji deşt da.

Li gor çavkaniyek agehdar, ew nûciwanê Kurd li meşa xwenîşandanên “Kuştargah” a bajarê Urmîyê bi sedema teqeya hêzên ewlehî bi awayekî dijwar hatibû birîndarkirin û ji tîrsa binçavkirinê li çûna bo nexweşxaneyê bona tedawiya pîzîşkî xwe parastibû.

Herwisa wê çavkaniyê da zanîn: “Hêzên ewlehî ew nûciwan ku di binerda mala xwe de li bin tedawiya pîzîşkî de bû, hatibû binçavkirin û navbirî piştê bo yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Urmîyê veguhaştin.

Wê çavkaniyê herwisa da zanîn ku roja Çarşemî 13ê Rezberê, hêzên ewlehî piştî çend roj ji binçavkirina Nîma, termê wî radeştê malbata navbirî kirine.

Di dawiyê de wê çavkaniya agehdar got: Hêzên ewlehî gef ji malbata “Nîma Şefeqdoşt” xwarine ku ji gotûbêj kirin digel medy-ayan xwe biparêzin.

Di nerazîbûnên seranserî yên Îranê de zarokek temen 15 salî canê xwe ji deşt da

Şeva Çarşemî 30’ê Xermananê zaroka bi navê “Emîrhusên Besatî” temen 15 salî di rewta kombûnên nerizayetiye li dijî qetla hikûmetî ya Jîna (Mehsa)Emînî bi teqeya rasterast ya hêzên ewlehî yên hikûmeta Îranê li bajarê Kirmanşanê canê xwe ji deşt da.

Pêka gotina çavkaniya haydar, termê wî zarokî roja Pêncşemî 8’ê Rezberê pi’î wergirtina soznameya nivîskî radeştî malbatê hatiye kirin û li guriştana gundê “Darxorî Hesênava” ya ser bi bexşa navenda bajarê Şabadê bi axê hatiye spartin.

Wê çavkaniya haydar zêde ji kiriye ku: Malbata Besatî çendîn caran bo haydarbûn li çarenivîsa korê xwe serdana navenda ewlehî û dadwerî kribûn, lê ti bersivê ji wan re nehatiye dan heta di encamê de wan navenda ji malata Besatî re telefola xistibûn bona wergirtina termê Emîrhusên serdana nexweşxaneyê Talqanî bikin.

Emîrhusên Besatî şeva Çarşemî 30’ê Xermananê li meşên nerizyete yên li dijî qetla hikûmeta ya Jîna (Mehsa)Emînî li şeqama Muderis bi teqeya rasterast ya hêzên ewlehî canê xwe ji deşt da.

Kolberek bi teqeya hêzên întizamî yên hikûmetî yên li ser sînora canê xwe ji deşt da

Roja Yekşemî 10’ê Rezberê kolberê Kurd yê bi navê “Saman Zar’î” û kurê Celal û xelkê bajarê Bane bi teqeya hêzên întizamî yên hikûmetî yên li ser sînora Hengejale ya wî bajarî hat kuştin.

Hêzên leşkerî bi bê agehdar kirina berê teqe ji wî kolberê Kurd kirine.

Termê wî kolberî hîn radeştî malbata navbirî nehatiye kirin.

Her di vê pêwendiyê de, roja Çarşemî 30’ê Xermananê kolberek din yê Kurd yê bi navê “Kerîm Asimanî”, temen 47 salî û xelkê gundê Necinêya serê yê girêdayî bajarê Bane, bi teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetî li sînora “Hengejaleya” ser bi bajarê Bane, canê xwe ji deşt da.

Wêneyên şehîdên mûşekbarana Kelha PDKî

